

Kolberî, êşa giran
her didome

»»» R:7



Mastê miya, di
pîstê se de heram
e

»»» R:3



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (374) 23-05-2020 Buha (1000) Tûmen

Tirsa rejîmê
ji serhildana
dubare ya xelkê

»»» R:4



Xebata nete-
wan di Îranê de
wê çawa serkeve

»»» R:6



Sala 1399`an saleke çerenivîssaz e

Xelkê nerazî û
bêzarbûyî yên
Îranê di piraniya baja-
ran de li dijî siyasetên
rejîma Îranê, rewşa
niha ya aborî ya Îranê,
û ew zilm û tepeseriya
ku li dijî wan tê kirin,
bi berdewamî nerazîbû-
na xwe tînin ziman.

Roja Duşemî 29`ê
Banemerê, ferman-
berên “Saziya Deng
û Reng” a rejîmê li
Tehranê kombûneke
nerizayetiye li dijî
gendelî û diziya ber-
pirsan û nehêlana
enfilasiyonê û dana
heqdestê paşketî, lidar
xistin.

Herwisa komê ji
kedkarên kompaniya
“Hêpkoya Erak”ê li
derheq nexuyabûna
rewşa berhemana wê
kopmaniyayê û komê
arîşeyên din kombûna
nerizayetiye lidar xis-
tin.

Hevdem heya çend
rojên berdewam ked-
karên şaredariya
“Erwend Kênar”
kombûnên nerizay-
etiya wan berdewam
bû û kedkar dxwaza
heqdestên xwe yên
paremayî dikin. Di
wê xwenîşandanê de
kedkar hawar dikin
û dibêjin “me pareyê
nan nîne û em bîrsîn
e, û şermendeyê mal-
batên xwe ne”.

Bi sedema rewşa xirab a aborî, nebûna derfeta kar, hejarî, giranî û bêhêvîbûn ji paşerojê, her roj li
ciheke Îranê xwenîşandan tene lidarxistin, lê ji aliyê rejîmê ve ti girîngiyek bi wan xwenîşandana nayê
danê, û heta wan kombûnan tepeser dikin û gelek ji xelkê nerazî jî bi tohmetên emnîyetî tene binçavki-
rin.

Ji aliyek din ve jî rewşa xirab a aborî û nebûna xizmetguzarî û hewcehiyan, akinciyên di gundan de, ne
neçar dikin ku gundên xwe çol bikin û ber bi bajarên dinê ve koç bikin.

Pêka raporên nûçegihaniyên rejîmê û bi piştgirêdan bi axavtinê berpîrsên rejîmê, gundnişînên derdorên
parêzgeha “Kohkîloye û Boyer Ehmed” û “Dêna û Margon”, bi sedma nebûna hewcehiyên jiyanê, û
nebûna xizmetguzarî û rewşa xirab a jiyanê, gundên xwe bi cih dêhlin û rû li bajaran dikin.
Diyardeya çolkirina gundan, siyaseta şaş a aboriya rejîmê ye, ku xelkê xwe ji hemû aliyekî ve di heja-
riyê de dihêle.

Bi liberçavgirtina wan rûdawane û ezmûna çend salên derbasbûyî dibe em bi xatircemî ve bêjin ku re-
jîm aliyê kêrî piştî sala 1396`an bi awayekî rohn û xuya ketiye nav krîzeke kûr de, ku em dikarin navê
wê danên “Krîza Tirs ji Herifînê”. Lewma aliyê kêrî ji wê demê ve piraniya siyaseta û stratîjiyên rejîmê
bo derbasbûn ji wê krîzê bûye, lê ne tenê serketî nebûye, belkî sê salê derbasbûyî nîşan daye ku bilind-
bûna asta krîzan di xîsteyan de ber bi zêdebûnê ve diçe. Lewma di çend mehên bê de, piştî vîrûsa Ko-
ronayê, rejîm wê rastî pêleke gelek bihêz a xelkê nerazaî bêt, ku gelek kes wê mijarê bi yek alî dizanin.



Bi giştî em dikarin bi vî awayî şiroveya sala 1399`an bo Îranê bikin: Sala 99`an saleke dijwar û çare-
nivîssaz dibe. Rejîm bi sedema siyasetên xwe yên şaş, wê rewşa aborî û siyasî û civakiya Îranê bi giştî
têk bide. Dorpêçên aborî ji berê zêdetir tundtir û berdewamtir dibin, bûdceya sala 1399`an aboriya
Îranê bi giştî wêran dike, xizîneya dewletê bi giştî betal e, vîrûsa Koronayê lawaziya rejîmê û kêrne-
hatîbûna wê sîstemê bi rohnî daye xuya, cudatiya di navbera rejîmê û xelkê ji hemû demê kûrtir û ber-
firehtir dibe, û çendîn krîzên din dibine sedema wê ku rejîm bo kontîrolkirina rûdawên çavnihernekirî
yên wek, mirina Xamineyî, êrişa leşkerî ya derveyî, kûdetaya leşkerî, îflasîyona dewletê û...hwd, gelek
lawaz be, û biçûktirîn derbe ku li pêykera rejîmê bikeve, wê rejîmê biherifîne. Lewma sala 1399`an ji
bo xelkê bîzêmet û dijwar, û herwisa çarenivîssaz jî dibe.

Sergotar

Kêşeya Xak

N: Kerîm Perwîzî

Di vê Rojhilata Navîn ya pirteqînewe û xak mînêjkirî de, dehan cureyên mînen dijîmirov û dijîcivakî û dijîxwezayê bi destên kesên serberedayî û bi destê koloniyalîstan hatine çandin, ku ger tu bi heştîyarî ve pêngavan hilnegrî, her bîstekê renga mînek di bin piyên te de biteqe.

Ya ku kultura carr a siyasî û civakî ye di vê Rojhilata Navîn de, pêk tê ji yektir qebûlnekirin û nehêstina nasnameyên cuda û hewla dagîrkirina nîştîman û dagîrkirina riha hevdu.

Cuda ji hemî kêşeyan, di vir de kêşeyeke bingeîn heye, ku pêk tê ji kêşeya xak û nîştîmanên cuda.

Bi sedema salên dûr û dirêj ên şer û êrîşa qewm û eşîr û qebîleyên curbicur hemû Rojhilata Navîn pir bûye ji alozî û tevliheviya neteweyî û tayîfî, û li cihên weha de, di nava dilê nîştîmana neteweyekê de, beşek ji neteweyeke din heye, ku ecêb xûya dike, ku gelo ew ji kuderê ve hatine wir!.

Kêşeya nîştîman û xakê kêşeyeke mezin e, û şer û kuştareke zaf li ser hatiye kirin, û ne tenê çareser nebûye, belku aloztir jî bûye. Bo mînak Kerkûk li Kurdiştana Başûr wek mîneke zamindar e ku her bîstekê egera teqîneke din a wê heye.

Di Kurdiştana Rojhelat û li raserî Îranê de jî, kêşeyên bi vî rengî zêde ne. Têkelawiya Kurd û Tirkên Azerî, Kurd û Fars, Kurd û Erebi û herweha Belûç û Fars, û yan Tirkên Azerî û Fars, û Fars û Turke-men û dehan xalên nakok ên

Dewreya 242 a despêkî ya pêşmergeyên PDKÎ dawî pê hat



Dewreya 242 a despêk a pêşmergeyên Hêza Pêşmergeyê Kurdiştanê di yek ji binkeyên PDKÎ de bi serketî dawî pêhat û keç û xortên evîndar ên azadiyê, çeka pir ji şanaziya pêşmergeyatiyê hevê-tine milê xwe.

Rêûresim bi sirûda netewî ya “Ey Reqîb” û ragirtina xûlek bédengî bona rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdiştanê dest pêkir.

Ew rêûresime bi amadebûna berpirsên siyasî û leşkerî, kadir û pêşmergeyan bi rê ve çû.

Piştî, Fermandeyê Hêza 127 a Pêşmerge, “Xalid Xaldar”, bi hilkefta bidawîhatina dewreya 242, bo beşdaran axivî.

Piştî hingê pexşanek bi navê “Rabûn ji Xev” ji aliyê beşdarbûyê dewrê “Aso” ve hate pêşkêşkirin.

Di pareke din ya rêûresmê de, rapora dewrê ji aliyê mamoştayê dewrê “Serwer Me’irûfî” ve hate pêşkêşkirin.

Peyama dewrê ji aliyê beşdarbûyê dewrê “Mihemed” ve hate pêşkêşkirin.

Piştî sirûdek bi navê “Silav Pêşmerge” ji aliyê pêşmergeyên dewrê ve hate pêşkêşkirin.

Wekî resma hertimî ya dewereyan, kesên serketî yên Yekem heya Sêyem di ceribandina siyasî, leşkerî û paraştina dîsîplînê de hatine xelatkirinê.

Ew xelat ji aliyê “Xalid Xaldar û Xelîl Milan” ve pêşkêşî wan kesên serketî hatine kirin. Rêûresim bi sitraneke beşdarbûyê dewrê ku “Ce’ifer” pêşkêş kir bi dawî hat.

din, li cihên cuda, her yek ji wan nuqteyê metirsîdar a siberojê ne, ku wê kêşe li ser çê bin. Di van rojan de kesên weha hebûn ku dubare hêcet li PDKÎ girtin ku çima dibêje parêzgeha Azerbaycana Rojava “Parêzgeha Urmiyê”, û çima îdiaya xaka Azerbaycana Rojava dike?!

Ya ku di siyaseta û bernameya PDKÎ de zelal e, qet timayîya xaka tu neteweyeke din nekiriye, lê li ser nîştîmana Kurd jî pêdagir e. Li cem PDKÎ parêzgehek ku Komara Îslamî navê Azerbaycana Rojava daniye ser, niha tenê Kurdnişîn nine, belku Kurd û Tirkên Azerî û Ermenî û Asûrî û xelkê din tê de dijîn.

Siyaseta PDKÎ bo diyarîkirina sînorê Kurdiştanê pêk tê ji du pîvanên sereke ku ew jî coxrafiya û xweşta piraniya akinciyên wir e.

Eva PDKÎ navek ku Komara Îslamî li ser parêzgehan danîbe qebûl nake asayî û xwezayî ye, jiber ku Komara Îslamî hewla helandina nasname û şêlûkirin û têkdana raştiyan dide. PDKÎ bawerî bi xebata pêkve ya neteweyên zulmlêkirî heye, û hewlê jê re dide, lê qet çavê PDKÎ li xaka neteweyên din nine, û ne jî çavpoşiyê ji nîştîmana Kurdiştan dike.

Mastê miya, di pîstê se de heram e



N: Serbest Urmiye

Di çend rojên derbasbûyî de û li gor ragihandina dewleta Almaniyayê hemû kar û çalakiyên rêxistina “Hizbullah” a Libnanê bi hêceta terorîstbûn û piştîvanî ji terorê ji aliyê vê rêxistinê ve hatin ragirtin û weke terorîst hate nasandin. Ev helwesta dewleta Almaniyayê xêncî maka terorê wate rejîma Îranê, razîbûneke herêmî û heya qasekê cihanî jî pêve xuya ye. Di serî de serokwezîrê Îsraîlê Binyamîn Natanyaho, di helwesteke cidî de, ev hewla dewleta Almaniyayê erênî nixand, û anî ziman ku divêt hemû dewletên alîgirê aştiyê “Hizbullah”ê weke rêxistineke terorîst binasin, û rê nedin ku piştîvanî ji terorîstan were kirin. Di heman demê de Erebiştana Siûdî û Behrînê jî di daxuyaniyên cuda de piştewaniya xwe ji vê biriyara Almaniyayê ragihandin. Li Kurdiştane jî heya niha Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bi fermî ragihandiye ku piştîvaniyê ji ragihandina dewleta Almaniyayê dike.

Ji aliyekî din ve kesayeti-yên naskirî jî weke “Michael Scott Doran” pispor û lêkolînavê navenda lêkolînê a “Hudson Institute” a Amerîkî jî di helwesteke cuda de ev hewla dewleta Almaniyayê erênî nixand û “Hizbullah”ê hemkûfê rejîma Îranê da naskirin. Ew li ser rûpela xwe ya “twitter”ê, “Hizbullah”ê weke tayê Libnanê yê spaha “Quds” a rejîma Îranê û berpirsiyarê beşên komandoyan, navenda perwerdehî û piştîvanê serêke yê piropagende û ...hwd ya wê arteşa hov dizane ku terorîst Qasim Silêmanî damezirandiye. Di haman demê de “Walid Phares” karnasê warê evlehî û siyaseta derve ya tora ragihandinê a “Fox News”ê ji razîbûna xwe ji

terorîst naskirina “Hizbullah”ê eşkere dike, û hewla han a dewleta Almaniyayê wek biryareke erênî dide zanîn ku dikare di şerê li dijî terorê de stratejîya dewletên endamên “Nato”yê û Amerîkayê li hev nêzîk bike.

Sedem çiyê ku hewil bo terorîst nasandina rêxistineke wiha tên dayîn? Ji bo ku rastî derkeve, hewce ye ku em vê baş binasin.

Pênaseyek kurt ji “Hizbullah”ê

“Hizbullah”a Libnanê rêxistineke siyasî û leşkerî ya Şîe ye ku sala 1982’an a Zayînî, bi alîkariya spaha terorîst a Îranê û bi piştîvaniya siyasî, leşkerî û aborî ya rejîma Îslamî ya Îranê û Xumeynî yê reberê rejîmê, dema ku arteşa Îsraîlê di basûrê Libnanê de bû hate damezirandin. Ev li ser navê rizgariya axa welat ava bû, lê di esil de armanca wê cîbicî kirina siyasîyên dewleta Îranê bo şer li dijî Îsraîlê, neyarên rejîma welayeta Feqîh a Îranê û di asta herî bilind de awayekî ku rojnameya “The Washington Post” ji zimanê “Robert Stephen Ford” balyozê Amerîkayê li Sûriye û El-cezayîrê ve, weke gemiya balafîrhîgir a rejîma Îranê di herêma rojhilata deryaya navaşt de dide zanîn. “Hizbullah”a Libnanê di esil de hêzên Îslamî yên weke “Hizb Al-Da’wa”, bizava Îslamî ya “Harakat Amal” û tevgera Îsamî ya “Fath” a Feleştînî, pêk tînin. Helbet di bin çavdêrî, piştîvanî û rênivîniyên rejîma îslamî ya Îranê de. Eva ne tiştek e ku were veşartin, belkû heya niha bi caran serokê vê rêxistinê wate Hesên Nesrullah, bi fermî ragihandiye ku rejîma Îranê pere û çekên wan dabîn dike.

Baskê leşkerî yê vê bi navê “al-Muqawama al-Islamiyya” wate berxwedana Îslamî, jî di sala 1983’an a Zayînî de, ji aliyê “Imad Favez Mughniyeh” endamê Libnanî yê tevgera Îsamî ya “Fath” ve li ser navê “Jihad al-Islami” wate tevgera cîhada Îslamî hate damezirandin. Di destpêkê de bi awayê nepenî çalakîyên çekdarî li dijî Îsraîlê dimeşandin, ku ji aliyê rejîma Îranê ve dihate tekûz kirin. Helbet heya sala 1985’an a Zayînî, “Hizbullah” bi navê cuda weke “Jihad al-Islami” û rêxistina paraştina xelkê bindest jî dida xuyakirin. Piştî sala 2003’an a Zayînî, dadgehekê li Amerîkayê ev yek eşkere kir ku hemû ev navên han yê baskê leşkerî yê “Hizbullah”ê wate “al-Muqawama al-Islamiyya” ne ku berpirsiyarê çendîn kiriyanên terorîstî ye. Weke ku me berê jî got di esil de armanc rizgarkirina erdê Libnanê yê li bin destê Îsraîlê de bû, lê piştî derketina arteşa Îsraîlê li axa Libnanê li sala 2000’an a Zayînî de, ne tenê dawî bi şerê wan yê çekdarî di Libnan de nehat, belkû piştî ku baskê siyasî yê “Hizbullah”ê weke hêzeke fermî kete nava sîstema siyasî û parlemana Libnanê de heya niha, weke hevalbendêke rejîma Îranê bi awayeke xurtir şerê çekdariyê bo misogerkirina siyasî û armancên rejîmê di herêma de didomîne. Weke mînak di Sûriya û Îraqê de mil bi milê hevalbendên din ên Îranê yên weke “Hashd al-Shaabi” û ...hwd, li dijî hezên azadîxwaz û hevalbendên cihanî yên li dijî terorîsmê, li çeperê şer de ye.

Çima terorîst e?

Ci tiştek di vê navberê de heye ku hêzeke wiha ku li ser navê rizgarkirina beşeke bindest ji welatê xwe hatiye damezirandin û di vê pêxemê de jî heya derxistina arteşa bîhanî li ser axa xwe xebateke berfireh kiriye, lê weke hêzeke rizgarîxwaz nehê naskirin û dikeve rêza hêzên terorîst de. Renge balkeşandineke kurt li ser nasandina terorê û hilsengandina siyasî û xebata hêza han me bigîne encamê.

Bi kurtî teror wate her cure kiriyarek ku gefê li evlehî, tenahî û aştiya cihanî bike. Yanî aştêk ji tirs û hovîtiyê ku dibe sedema tundûtûjî û kuştinê ku pitir rêxistin yan dewletek bi armancên curbicur yên weke siyasî, mesebî yan aborî bi rê ve dibe. Terorê di pênaseyên berfirehtir de aliyên curbicur hene, ku heke em li gor wan pênaseyan kar û xwerêxistina dewletekê hilsengînin, dê encamên vê baştir derkevin.

Çend nimûneyên kêma yên ku li jêr de hatine weke beşek ji kiryanên rêxistina “Hizbullah”ê ne, ku li gor pênaseya cihanî ya terorê, kar û çalakîyên vê rêxistinê dibin qada kiryanên hov û cinayetê li dijî mirovahiyê û dibin belgeyê selimandina terorîstbûna wê. Aliyê kêma heya niha destê vê rêxistinê bi awayekî fermî di wan tawanane de hebûye û eşkere bûye:

- Revandina balafîra “TWA847” a sala 1985’an a Zayînî, di navbera Qahîre û “San Diego”ê de.

- Kuştina xelkê sîvil, rojnamevan û zarokan. Weke mînak danîna bombeyê a 23. Oktober a 1983’an û teqandina navenda hêzên Amerîkayê, li Beyrot a paytexta Libnanê ku tê de 241 leşker û şeş welatîyên sîvil yên Amerîkayê, û her wiha 58 leşker, jinek û çar zarok di avahiyê Firansiyan de hatin kuştin.

- Terorkirina neyarên rejîma Îranê li derveyî welat ku heya niha jî bi awayekî berdewam e. Weke mînaka herî berçav terorkirina Dr. Şerekkendî Sekreterê Giştî yê wê demê yê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê di sala 1992’an li Almaniyayê.

- Çendîn nimûne ji reşbigîrî û revandina xelkê sîvil û welatîyên dewletên rojavayî ji sala 1980’î şûnde.

- Danîna bombeyê û kuştina 80 welatîyên sîvil di navenda Cihûyan a “AMIA” sala 1984’an li welatê Arjantînê û ... hwd.

Helbet eva beşeke kem jî cinayetên wan yên derbasbûyî ne. Xêncî van mînakên, û her weke me pêşde jî bas kir, niha jî mil bi milê terorîstên din yên hevalbendên rejîma Îranê di herêma cuda de, di çeperê şer li dijî hezên azadîxwaz de ye, û roj nine ku komelek tawanên dijîmirovî li ser navê wan nehatibin tomarkirin, ku heke berjewendiya zilhêzan rê bide vîjdana wan, dibe ku paqijkirina cihanê ji rêxistinên wiha bibe erkeke cihanî û aştî û mirovahî bibin du peyvên pîroz ên cihanî.

Tirsa rejîmê ji serhildana dubare ya xelkê



N: Dara Natiq

Civatgeha Îranê bi giştî û Rojhilatê Kurdistanê bi taybetî di rewşek pir aloz û dijwar de derbas dibe. Siyasetên şaş û dujminkarane û şerxwazane yê rejîma Îranê di asta herêmî û cîhanî de, bûye sedema dûrketina civatgeha wî wilatî li karvanê pêşkevtin û zanişt û teknolojiya navdewletî û herwisa herifîna bingeha aborî ya wî wilatî û jêhelçûna rêjeya hejariyê di Îranê de. Ji aliyekî din ve têkvepêçana Îranê di asta herêmî û şikist û meşên nerazîbûnên li Îraq û Lubnan û welatên dinê li hember mudaxilekirina rayedarên rejîma Îranê li kar û barên welatên wan û saportkirina girûpên terorîstî û têkdana tenahiya herêmî, ji aliyekî din jî dorpêçên aborî yên ji aliyê Amrîkayê bo ser wî welatî, bingehe û sîstema rêveberî û deşhilatdariyê di Îranê de gihandiye ser lêva herifîn û nemanê.

Bi hebûna deşhiletek han dîktator û pawanxwaz, jiyan gihîştîye asta mirinê û buhayê jiyan û kerameta mirovan her roj tê bînpêkirin. Tepeserî û bêdadî û girtin û kuştina xelkê her roj zêde û zêdetir dibe. Krîz li pey krîzê êdî xelkê belengaz yên welêt bêzar û bêhêvî kirine. Meşên nerazîbûna xelkê bêzarbûyî li siyaseta rejîmê, raştiya heyî car din bo raya giştî daxuya kirin ku Îran bi tev pêkhat-eya xwe ve di krîzê de ye û gihîştîye binbeştê û li ser lêva herifînê ye. Civatgeha Îranê bi giştî û bi taybetî netewên bindest û yek ji wan xelkê mafxwaz û azadîxwaz yê Kurd ku zêdetirîn rêjeya qorbanî û cangoriyê dane, bi kiryar û tekoşîna xwe ya mafxwaziyê dane eyanê ku

êdî wan ti hêviyek bi rejîma Îranê nîne û ew daxwazkarê herifîn û nemana rejîma Îranê ne û ji bo avakirina sîstemek demokratîk û gelî xebat dikin. Jiyan û guzerana xelkê bûye qorbaniyê siyaseta şaş yên rejîmê û krîza hundir û navxwe ya wî wilatî. Krîza siyasî, aborî, çandî, jîngeyî û birêveberî ku bûye sedema serhildana sedan diyardeyên cur bi cur yên civakî û beşek li jiyanasayî ya xelkê Îranê. Tepeseriya sîstematîk bûye beşek berdewam û fermî ya rojne ji siyaseta rejîma Îranê. Serbarê tev wan krîz û bêbextiya ku civaka Îranê pê re rû bi rû bûye, geşe kirin û belavbûna roj li roj zêdetir a vîrûsa Korona û bilindbûna amara mirin û qorbaniyê ya wê belaya malvêranker û bêkifayetiya û dest li ser dest danîna damûdezgehên rejîmê ji kontrol nekirin û bêmudîriyeta wan ji rû bi rû bûna wê vîrûsê re, jiyanasayî ya xelkê tal û aloztir û diwartir kiriye.

Rejîma Îranê êdî di hundirê welêt û li asta civatgeha wî wilatî de rewziya xwe ji dest daye û



li asta cîhanî û herêmî de jî roj li pey rojê dikeve perawêzê û di bin zext û givaşên berdewam de ye. Rayedarên Îranê li cihê vê hindê ku li hizra çareserkirina arîşe û girêpêçên civakê de bin û cehda baştirkirina rewşa jiyanasayî ya xelkê û çareseriyek aştiyane û pêbend bin bi yasayên navdewletî, lê mixabin berdewam in li ser siyaseta pawanxwazî û têkderane ya xwe. xerckirina hezîneyek zaf bo xurtkirina navendên xwe yên ewlehî û tepeserkar. Teyarkirina hêza xwe ya leşkerî bi alavên tepeserkariyê bo berengarbûneweya her meş û dengê nerazîbûnê di hundirê welat de. Tirsa rejîmê niha de ji serhildan û meşên nerazîbûna milyonî ya li dijî wê rejîmê ye. Xelkê bêzar ji siyaseta û deşhilatdariya dîktatora Îranê li her derfetekê bo gihandina dengê nerazîbûna xwe mifahê werdegrin. Arîşe û girêpêçên civakê ew qas kûr û berfireh in û nemaze piştî vê vîrûsa malvêranker û bêkifayetiya rayedarê Îranê li kontrolnekirina wê belaya han ku êdî kerb û kîna xelkê welêt li rejîm û damûdezgehên wê hîndey din zêdetir kirye. Tirsa serhildanek mezin û sertaserî bo têkvepêçan û hilûşîna kela zordarî û dîktatorî ya Komara Îslamî, xev ji çavê rêber û rayedarên nîzamê heram kirine û berdewam gefan ji xelkê dixwen û mijûlê darê-tina pîlan û xwe amadekirinê ne bo tepeserî û komkujiya meşên nerazîbûnên.

Êdî rejîmê rêya wegeriyanê nemaye û stêrka bextê wê hêdî hêdî ber bi avabûnê we diçe. Gel êdî biryara xwe daye û çiyê din naxwazin di bin siya wê rejîma han de jiyanek rezîlane û bi kul û keser derbas bikin. Di pêşerojek nêzîk de em ê car din şahidê meş û serhildanên seranserî yên nerazîbûna xelkê bin bo ji holê rakirina kela zordariyê di Îranê de.



Prensîpên exlaqê şoreşvanî di PDKÎ de



N: Elî Munezemî

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ku bo demokrasî, bideştveanîna mafê netewî û dadperweriya civakê têkoşînê dike, bi sedema wê yekê ku her yek ji wan armancan bi tenê pêkanîna guhertinên bingehîn in di civakê de, dikeve rêza Partiyên şoreşvan. Ne hevceyê gotinê ye ku endamên Partiyek şoreşvan bi xwe jî şoreşvan tên hesabandin. Çalakiyên kesek şoreşvan, çalakiyên siyasî ne. Ji ber ku çalakiyên wan di pêxema birêvebirin yan jî hikumdariyên derheq pêşveçûna civakê de ne. “Bismark” wê yekê bi “hunera mumkin” navdêr dike û “Kant” jî dibêje ku bingeha siyasî li ser zanîsta mafnasiyê dibe were danîn û zanîsta mafnasiyê bi xwe jî dibe li gor exlaq were raştdarkirin. Gava ku bas li exlaq di siyasî de tê kirin, bi wê wateyê ye ku bas li siyaseta îde`al tê kirin û ew yek jî digel siyaseta re`al ku di siyaseta re`al de siyaseta medar li pişt her bûyereke an karekê li motîfêke digerin ku dizivire ser zêdekirina hêzê û ew hêz jî bo wan pêdivî ye ku bikaribin pê ewlehî û sinorê desthilatdariya xwe biparêzin. Lê siyasîvanê ku li ser bingeha îdealan siyasî dibe, armancên mezin wek parastina mafê merivan, pêşxistina demokrasî û aştiyê xwe re dike armanc û rasterast bi armanc û berjewendiyê wan yê netewî re negirêdayî ne.

“Dr. Qasimlo” ku di PDKÎ de wek mamosta û rêberê hizrî yê wê Partiyê tê naskirin, siyasîvan û rêberê pragmatîst bû ku xwediyê zaf prensîpên

neguher bû ku bi çî nirxekê hazir nedibû wan prensîpan bişkêne. Wî di hundirê Partiya xwe de têkoşîn dikir ku endamên Partiya xwe jî li gor wan prensîpan perwerde bike û bi wê hindê jî rûmetek merivane li şoreşa gelê xwe bi dinyayê re bide nîşandan. Du belgeyên girîng hene bo bas li ser prensîpên exlaqê şoreşvanî di nava refên PDKÎ de: Lewha «Sîmaya Demokrat» û nirx û prensîpên ku bo endamê Partiyê di pêrewa hundirîn ya partiyê de hatinî. Di wê gotarê de emê bi kurtî hindê li wan prensîpan bêxin ber basê.

1- Sîmaya Demokrat: Prensîpên ku Dr. Qasimlo di “Sîmaya Demokrat” de formole kirinî, prensîpên herî binirxîn bo kadroyên Partiyê ku wek kesên demokrat û şoreşvan di wê çarçoveyê de temrîn bikin û xwe perwerde bikin bo ku bikarin bibin xwediyê kesayetiyek demokrat û şoreşvan.

2- Kesek ku endamê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê be, kesek azadîxwaz e. Azadî bo Qasimlo û endamê Partiya wî, bilindtirîn nirx e. Ji ber ku “azadî, keramet û şexsiyetê dide mirovan”. “Kant”, azadî bi yekmîn prensîpa exlaqî dihesibîne û dibêje ku: “Eve azadiye ku nirxek bê şert û merc dide mirovan”.

3- Gava ku bas li Partiyek siyasî tê kirin ku bo azadiyê têkoşînê dike, dibe endamên wê Partiyê jî, azadiya xwe hebin. Ji ber wê hindê kesên şoreşvan dibe bi têgihîştin û azadane erkên xwe di şoreşê de cî bi cî bikin. Li ber hindê jî sepandina biryaran di PDKÎ de berevajî exlaqê şoreşvanane ye û Qasimlo dibêje ku erkê berpirsên Hizbî ye ku endamên organa xwe bo cîbicîkirina biryaran îqna bikin û “eger çî di navbera sepandin û îqnakirinê de, sepandin hêsane, lê di demê dirêj de, eve îqnakirine ku serdikeve”.

4- Şerê rewê: Dibêjin ku di navbera du hêzên drmkokrat



de zaf bi kêrî hegera wê hindê heye ku şer derbikeve. Lê hegera şer di navbera hêzek demokrat û hêzek dîktator de zêdetir e. Gava ku aliyekê hemû rêyek ceriband bo çareseriyê pîrsgirêkekê û nekarî digel dijberê xwe bigîje çareseriyekê, hingê ev dikare ji hêza zivir mifah werbigre. Ew prensîpa her tim ji aliyê PDKÎ ve hatiye meşandin. Herwisa wê Partiyê wek prensîpek xwedî exlaq û perensîp hegerek rewê hebûye bo destpêkirina şer, di dema şer de qet hêza vêranker li dijî dijminê xwe bikar neaniye û berevirda hindê jî kiriye ku rêyek bo jiyana aştiyane tevî dijberên xwe (neteweyên dagîrkerên Kurdistanê) bihêle.

5- Rêveberiya girûpî û biryarên bikom: Ji ber ku biryarên bikom di sîstîmek demokratîk de di îradeya giştîve serçave digre û ew îradeya bingeha serveriyê ye û bilindtirîn desthilata yasadanî de, cem endamên şoreşvan û demokrat yê Partiyê, prensîpek neguher û girîng e.

6- Şêveya danûstandina endamên Partiyê tevî xelkê: Dr. Qa-



simlo pêşmerge wek zarokên xweştevî yê xelkê pênase dike û dibêje ku pêdiviyê pêşmerge di rabûn û rûniştinê xwe tevî xelkê de bi biratî tevbigerin û reftarek baş li xwe nîşan bidin.

7- Kesek şoreşvan dibe berjewendiyê gel û welat li serveyî hemû berjewendiyekê girûpî û takekesî ya xwe dabinê û her tim bo parastina gel û welat amade û fedakar be.

Encam:

Kesek şoreşvan ku dibe xwediyê exlaqê şoreşvanî be, pêdiviyê ku azadiyê wek bilindtirîn armanca xwe bihesibîne û di jiyana xwe ya siyasî û civakî de azadiya xwe li serveyî her tiştêkê dabinê. Kesek şoreşvan dibe xwediyê kesayetiyek demokratîk be, hurmetê ji biryarên bikom re dabinê ku li îradeya giştîve serçave digrin. Şoreşvanên xwedî exlaq aştiwxaz in, lê eger neçar bin ku şer bikin, şerê wan li gor prensîpên “şerê rewê” dibe bi rê ve here. Li hemûyan girîngtir eve ye ku dibe kesê şoreşvan li netewê û welat xwe hez bike û li pêxema parastina wan de kesek fidakar û xwenevîst be.

Xebata netewan di Îranê de wê çawa serkeve



N: Nûredîn Sofîzade

Her wekî hemî aliyek dizane, di çarçêveya cografîyaya Îranê de zaf Ol û netew û cudahî hene û hekî gotî Îran welatekî fire netewe û fire ol û fire reng û cudahî ye.

Hekî em biçine ser dîrokê û sedemên vê yekê ku bo çî Îran bi wî awayî ye û Îran çawa çêbûye, renga li qalibê goterekî hankî de cih nebe û gelek demê dixwaze, lê di wî serdemî de eşkereye û bo me eyane ku civatgeh û pêkhat-eya Îranê yekdest nîne.

Di Îranê de hekî em basê Ol û kultûr û cudahiya çandî nekin, em tenê bêne ser mesela cudahiya netewan, em dibînin ku Îran pêkhatiye ji netewên Kurd, Belûç, Erebi, Tirkîmen, Tirkê azerî û Fars û heta hinek itnîkên dinê jî renga hebin ku ev jî xwe bi netewe dizanin, weke Gîlek, Bextiyarî, Mazenderanî, Lor, Qeşqawî, Zendî û yên dinê. Wan 6 netewên ku me nav jê anîne, ji çî aliyekê de pêwer û xalên hevpare wekhev çînin, wek Zimanê hevpar, dîroka hevpar, çanda hevpar û axa hevpar, renga bo gelek kesan ev pirsyare bête pêş ku eve nîne axa di hevpar de bi navê Îranê dijîn? Dibe di bersivê de bêjin ku wan netewane girîngtirîn arîşe û cudahiya wan pirsgrêka axa wan e. Para zêde ya wan netewane ku kevtine nava cografîyaya Îranê li pişta sînorên Îranê de ne.

Lêre îsbat dibe ku pareke kêr ji axa Kurdistanê, Belûçistanê, Azerbaycanê, Tirkemen Shehrayê, Erebi-stana Ehwezê, ji Axa mezin a

heçî kîjan ji wan netewane hatiye qetandin û cudakirin ku Îrana îro pê hatiye çêkirin.

Bi dirêjîya pitir ji sed sal e ku her carê û bi regekî hikûmet û deştilata navendî ya Îranê her ji serdemê Qacariyan ve bigre heya digîje deştilata Riza Xanê Mîr Penc û Mihemedê kurê wî, û piştî hingê ji rejîma Îslamî ku eve 41 sal e deştilat girtiye deştê xwe û cehd kirine ku îtirafê bi raştiya fire neteweyîbûn û cudahiye pêkhatiya xelkê Îranê nekin û li pêxema sepandina yek “milet”, “yek xak”, yek Ol, yek çand, yek ala, yek welat û yek dewletê de, siyaseta asmîlasiyona wan netewane bigirine bera xwe û înkara hebûna wan dîkin.

Heya wira xuyaye ku ji bilî netewa baladeşt û hakim, hemî netewên dinê ku di Îranê de dijîn, qeder û çarenivîsiya wan weke heve û bi dirêjîya dîrokê bo evê ku bê deng bin û ji nasnama xwe xwedî dernekevin, kevtine ber girtin û kuştin û asimîlasyonê û di bin zilm û zora herî hovane ya hikûmeta navendî de bûne.

Wan netewane jî di hember de berxwedanî kirine û şerê xwe paraştinê kirine û ji aliyekê bi xw-eragirî û teslîm nebûnê berahîka ji navçûna xwe girtine, ji aliyekî dinê jî bi vî hindê neseqînê



ku heçî kîjan ji wan netewane gorî şîyan û derfetan xebat kirine ku bikarin bigîjne mafê neteweyîye xwe ku şerê hindê dîkin ku ev jî çî warekê ve kêmtir nînin ji netewa serdest û ev jî hemen maf û azadiyan dixwazin ku netewa serdet ku Fars e hene.

Çî yek ji wan netewane mixabin heya niha nekarîne bigîjne mafê xwe.

Heçî kîjan ji wan bi cuda û gorî taybetmendîya xwe xebat kiriye da ku bigîje mafê xwe, hinek caran yek ji wan netewan bi awayê her radîkal xebat kiriye û heta kariye hikûmeta navendî tîk bişkên, lê ji ber vî ku tenê bûye û nekariye bona bihêzkirina eniya hemberî rejîmê digel netewên dinê hevxebe be, mixabin bo heyamekî dirêj nekariye xwe bigre û li encamê de dîsan hikûmet serkevtî ye.

Niha ku qedera wan netewane weke hev e, hemî bê maf in, ax û kultûr û Ziman û nasnama wan hatiye zevtkirin, hekî qedera wan yek e dibe xebata wan jî yek be.

Rejîmên deştilatdar û bi taybetî di wan 4 dehkên wê dawiyê de, rejîma Îslamî ya Îranê mifah ji nebûna hevxebebiya di navbera wan netewane de wergirtiye.

Ger yekîti û hevxebebiyê û alîkarî di navbera wan netewên bindest de hebe, ku daxwaziyên her hemîyan weke hev in, bê guman serkevtin û geheştina wan netewan bi mafê xwe gelek sanahî dibe.

Rejîma Îslamî ya Îranê çiqas dirinde û bihêz be jî, nikare xwe di hember yekîti û yek xebatiya netewên Îranê de bigre, rejîm niha ji heçî demê zêdetir lewaz û bêhêz û şepirze ye, wê rejîmê çî rewariyek bal xelkê Îranê nemaye, di astê nawnetewî û navxweyî û aborî û “meşrûîyet”ê de şikest xwariye û di esla xwe de herifiye, lê tenê hewceye hêzekî yekgirtî di navbera netewên Îranê de hebe bo hevxebebiyê, û xelkê vî yekîtiyê pişt serê xwe bibîne, bê şik tenê paldanekî kuşke hewceye ku dîktatoriya Îslamî sernixûn be û biçê nava kendalê dîrokê, û heçî kîjan ji netewên Îranê di bin sîbera azadî û demokrasî û sistemekî fêdal de, û qedera xwe bigirine deştê xwe.

Ger yeketî û hevxebebiyê di navbera netewên bê maf de çêbe û hebe, ev roje gelek nêzîk bûye.

Nerîna Lîderan



“Mike Pompeo”:

“Xamineyî û Zerîf xwesta “Hitler” derheq qirkirinê dubare dikan”.



“Brian Hook”:

“Em bilez nînin, em ê siyasetên xwe yên niha li derheq Îranê bi-domînin”.



Benjamin Netanyahu:

“Em careke din dubare dikan, her aliyek gefa jinavbirina Îsra`îlê bixwe, xwe dê rastî wê gefê bê”.



“Elî Xamineyî”:

“Îsraîl wekî Koronayê ye û em dibe hember wê راستiya metirsîdar û ziyankar rawestî û şerê wê bikin”.

Kolberî, êşa giran her didome



N: Eskender Ceiferî

Her sal bi sedan kolberên Kurd ji aliyê hêzên sersînora ên rejîma meleyên Îranê ve tene kuştin yan jî tene birîndarkirin. Her roj, bihîstina nûçeyên teqeya rasterast li kolberan, bûye beşek ji jiyana Kurdan. Ev jî di demekê de ye ku çend salan beriya niha, Elî Xamineyî, rêberê rejîma gemar a Komara Îslamî ferman dabû hêzên ewlehî û sersînora ku teqeyê li kolberên Kurd nekin.

Herwisa beriya çend salan serdozgerê giştî yê Îranê jî gotibû, ew kesên ku li ser sînora kolberiyê dikan nabe rastî zorî û êrîşê bînin ji ber ku tekane çavkaniya jiyana wan kolberî ye. Wî, behsa kolberên Kurd ên ku li ser sînora bi piştan û bi milan barên giran hil didin, kiribû û gotibû divê hêsankari ji wan kesan re bê kirin ku kolberiyê dikan. Wî tekez kiribû ku ew nabe ji aliyê hêzên sersînora ve rastî zorî û êrîşê bînin ji ber ku tekane çavkaniya jiyana wan, kolberî ye û ew tenê dikarin di vî riyê de debara jiyana xwe bikin.

Li gora benda 25'an a Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan, xwarek, cil û berg, xanî, xizmetên tendurîstiyê û xizmetên civakî yê pêwîst jî di nav de mafê her mirovî heye ku bibe xwedî asta jiyaneke guncan a ku bikaribe gumrehî û tendurîstiya wî û malbata wî pêk bîne û jê re misoger bike. Her mirovek ji ber rewşa bêkarî, nexweşî, seqetî, hejarî, pîr û kaltî yan jî gava ku ji derfetên debara jiyana û ji kar bîyî hemd û vîna xwe bêpar bimîne û ji bo rewşên din, xwedî mafê ewlehiya civakî ne. Ev benda Danezana herwisa maje dike

ku dayîk û zarok, pêştir û bi taybetî xwedî mafê piştevanî û alikariyê ne. Hemû zarok, çî di dema zewacê de û çî jî li derveyî zewacê çê bûne divê ji heman ewlehiya civakî sîdê werbigirin û mifahdar bibin. Lê berovajî hemû bendên Danezana, kolber hene 70 salî ne û hinek jî hene 13 salî. Lê ne pîrtirînên wan û ne jî ciwantirînên wan, di bin siya rejîma gemar a Tehranê de nabin xwediyên ti mafekî. Kesek li mafên zarokan jî napirse û li mafên pîran jî napirse.

Hêzên sersînora ên rejîmê ku girêdayî Sipaha têrorîstî ya Pasdaran in, hertim di çend mêtiriyê de û bê hoşdariya pêşîn, teqeyê li kolberan dikan. Eger kolber nekevin ber reniyê, eger nekevin nav çem yan jî nekevin ser mayînan, eger ew ji çiya û zinaran neverisin, lê belê ewê rastî teqeya hêzên sersînora bînin û dibe ku jiyana wan bikeve metirsiyê.

Hinek ji berpirsên navendên leşkerî yê rejîmê hene ku rê didin ew bi dayîna bertilan, ji xalên sînora derbas bibin û ew barê



giran ku ji bo debara jiyana didin milên xwe, bigihînin cihên ku ji bo wan hatiye destnîşankirin.

Lê ji xeynî wan bertilan, siyaseta giştî ya Sipaha têrorîstî ya Pasdaranê rejîmê, kuştina Kurdan e. Hem kolberan bi çavê têkder dibîne û hem welatîyên sivil. Hem endamên partîyan, weke cudaxwaz dibîne û hem jî karker û kedkaran.

Ew rejîma ku qet baweriya wê bi demokrasiyê nîn e, ji xwe re kuştina dijberan kiriye binge. Kurd jî her ji destpêkê ve dijberên rejîmê bûn û lewma jî bi kuştina kolberan, hema erkî bicî dikan ku Xumeynî daye ser milên wan. Ew fermana Cîhadê, heya îro jî li Kurdistanê berdewam dike û aliyên navdewletî jî naxwazin ji bo parêzvanîkirin li mafên Kurdan, pêwendiyên xwe û berjewendiyên xwe yê hevpar bi rejîmê re têk bidin.

Ji xeynî van mijaran, têkdana ewlehiyê û çênekirina derfetên kar jî, siyaseteke din a rejîmê ye ku bi vî karî dixwaze çavên xelkê Kurdistanê, tim li destên rejîmê bin.

Eger Kurdistan bi sedan kangehan li xwe digire yan jî beşeke zêde ji baca salane ji sînora Kurdistanê derbasî vî welatî dibin, lê belê rejîm tenê weke navçeyeke dagirkirî li Kurdistanê dinêre û bi van pereyan ku li Kurdistanê dikevin dest rejîmê, ti karekî ne ji bo pêşxistina navçeyên Kurdan encam dide û ne jî, ji bo danîna derfetên kar, rêkaran bi kar tîne.

Eger xelkê navçeyên sînora neçar nebin, kolberiyê nakin. Lê rejîm qet naxwaze ev xelk têr be. Armanca rejîmê, birçîhêlana xlekê ye ji bo ku bikare bi vî rengî, siyaseten xwe yê gemar berfirehtir bike lê xelk tenê di xema nanê şevê de be.

Xwendina lihevkirineke kurdî-kurdî bi nêrînên cuda cuda



Amadekirin: Ebdulazîz Qasim

Piştî gelek însiyatîf û hewldanên serokatiya Herêma kurdiştanê û Fransa û Brîtaniya û herwiha banga fermendarê HSD, Mezlûm Ebdî ji bo nêzîkbûna aliyên kurdî, li gorî “Rawangeha Sûrî ya Mafê Mirov”, ku li roja 29’ê meha borî, bi serpiştîya nûnerê Wezaretê Derve ya Amerîka li kurdiştana Sûriyê, William Robak û cêgira wî Emily Brendit civînek bi amadebûna nûnerê Fransa li gel partiyên kurdî bi mebesta (yekgirtina helwesta siyasî ya Kurdî li Sûriyê) lidar ket. Li gorî çavkaniyên siyasî ji Qamişlo ji ajansa Sputnik re hat gotin ku Washington û Parîs berdewam in li ser hewldanên xwe yê siyasî li bakur û rojhilatê Sûriyê bi aramca dirîstkirina rêkeftineke Kurdî-Kurdî, û avakirina rêveberiyek nû li wê navçeyê û herwiha ku ev pêngav wê bibe destpêk di amadekiriyên navdewletî de ji bo bidawîkirina krîza Sûriyê û di avakirina hikumeteke nû de. Hin çavkaniyan ragihand ku nûnerê Wezaretê derve ya Amerîka guvaşan têxe li ser ENKS û PYD ji bo gihiştina rêkeftineke siyasî ya kurdî-kurdî.

Derbarê vê yekê, nivîskarê kurd yê Efrînê Înayet Dîko



Nivîskar: Înayet Dîko

di gotarekî de nivîsand ku “li Qamişlo şerekî dijwar diqewime, di navbera du aliyan de, Amerîka û Kurdiştana Iraqê ji aliyekî ve û îstîxbarata Tirk û Sûrî ji aliyekî din ve! û got ku Amerîka bi rêya siyaseta xwe ya nû hewl dide ji bo yekkirina hêzên “HSD û Pêşmerge Roj” di hêzeke leşkerî ya hevgerî de, û piştî ve hêza leşkerî ya kurdî tevî projeya opozîsyona Sûrî û danûstandinê “Cenevre” bike ji bo bicihanîna biryara “2254” ya Encumena Ewlekariya Navdewletî li ser avakirina hikûmetek berfireh ku pêgehê mezî yê kurdan têde hebe di nivîsa destûra Sûriyê de, û da zanîn ku Tirkîye naxwaze ev senaryoya nû ya Amerîkî serbikeve û wê bi rêya çeteyên xwe di opozîsyona Sûrî de hewl bide hin saziyên aşîrî û siyasî bi navên” Kurdî” yê alîgirên xwe li şûna ENKSê tevî hêzên opozîsyona Sûrî” bike. Înayet Dîko bal kişand ku Tirkîye dê hemû senga xwe ya îstîxbaratî, leşkerî, ewlehî, lojîstîk bikar bîne ji bo rêbigire li pêşîya her rêkeftineke kurdî-kurdî. Derbarê helwesta Rusya û hikûmeta Sûrî jî, dîr ji danûstandinê “Cenvere”, akademîsyonê kurd, Dr. Ferîd Sadûn, di daxuyanekê de ji bo malpera almadeen re ya nêzîkî medya desthilata Sûriyê, got ku “berdewamiya hewldanên Amerîkî ji bo bidestxistina lihevkirineke Kurdî-Kurdî dê encaman li ser erdê bidest bîne, û got ku Rusya jî di hevdiştinên xwe de yê li gel partiyên kurdî daxwaza rêkeftineke kurdî-kurdî kiribû, piştraşt kir ku her “pêngavek berbi bidestxistina rêkeftineke Kurdî li Sûriyê, dê piştigiriyê navnetewî, herêmî û heta ji aliyê “hukûmta Sûrî” jî werbigire li gorî axaftina wî, û herwiha da zanîn ev yek wê bibe sedema peydabûna hêzeke siyasî û leşkerî ku dibe rêkeftin li gel bibe li ser çarenivîs û paşeroja herêmê dîr ji destwerdanên leşkerî, û dê bibe gavek giring ji bo peydabûna aramiyê li herêmeke cografî ya berfireh li ser axa Sûriyê”.



Her derbarê helwesta Rusya, Serokê hevbeş yê “PYD” Enwer Muslim di daxuyaniyekê de ji “Sputnik” re aşkere kir heta niha ti helwestek ji hêla dewleta Rusî ve, çi neyînî û çi erênî nîne, û got ku em hêvî dikin, ku peymanek Kurd-Kurdî peyda bibe û piştî rêkeftineke kurdî di gel hikûmeta Sûrî di bin çavdêriya Rusya de bibe”.



Nivîskar: sebrî Resûl

Ji hêlêke din ve, Siyasetmedar û nivîskarê kurd Sebrî Resûl di daxuyaniyek taybet de ji bo rojnameya Agirî got ku zehmetî û erkên mezin dikevin di pêşîya diyaloga dibe di navbera (Tev.dem) û ENKSê de, di nav de ku divê kurd li ser çarenivîsa xwe û mafên xwe yê destûrî biryarê bidin, û ji bandora biryarên derve, nemaze ji bandora biryarên dewletên dagîrker rizgar bibin, û aşkere kir ku zehmetiya herî mezin dikeve di pêşîya çawanîya misogerkirina mafên

destûrî yê gelê kurd de, ku di her rêkeftineke di navbera PYD û ENKSê de, divê bi çî awayî destberdarî nebe ji mafên gelê kurd wekî netew û miletekî xwedî maf li ser axa xwe ya dîrokî, herwiha divê ew maf di hêlên pan û fireh de bêne destnîşan kirin. Sebrî Resûl bal kişand li ser metirsiya planên dagîrkeran û da zanîn ku nabê sivikatî bi darûdestekên îstîxbaratên dewletên dagîrker bibe, ku bi her awayekî dê hewl bidin ji bo têkbirina her lihevkirineke kurdî û yan jî valakirina pirs-girêka kurdî ji naveroka wê ya netewî bi dirûshmên vala û bêyî mafên raşteqîn. Resûl derbarî gotûbêjên ENKSê digel PYDê, piştraşt kir ku erkeki zehmet û mezin li pêşîya ENKSê ye, û mafê gelê Kurd bi “Hêlêke Sor e” binav kir, û got ku di bin çî şert û mercan de nabe destberdarî ji mafên netewî bibe, tevî ku cemawerê kurd piştî dayîna evqas ked û qurbanî wê her rêkeftineki red bike û wê qebûl neke dema ku ew lihevkirin ne li ser bingeha mafên rewşa yê gelê kurd be. Ji ber rewşa heştyar ya vê diyalogê, ji hêla xwe ve, endamê desteya serokatiya ENKSê ji bajarê Qamişlo Fêsel Yûsif li ser mijara van gotûbêjan red kir ku ti daxuyaniyekê bide ajansa “Sputnik”, û diyar kir ku Sero-katiya ENKSê soz daye ku behsa rewşa danûstandinên bi (PYD) re li ser medyayê nekin.

Di girtîgeha Xoyê de 13 kes tûşê vîrûsa Koronayê bûne

Zêdetir ji 10 kes di girtîgeha bajarê “Xoy”ê de raştî vîrûsa Koronayê hatine û berpirsên hikûmî jî li ser çareserkirina pizîşkiya wan tûşbûyan xemsarin.

Bi gotina çavkaniyeke agehdar, 13 kes ji personel û hepsiyan di girtîgeha bajarê “Xoy”ê de, tûşê vîrûsa Koronayê bûne û berpirsên girtîgehê îzna veguhestina wan hepsiyên tûşbûyî bo nexweşxaneyê derveyî girtîgehê nadin.

Herwisa, wê çavkaniya agehdar got: “Yek ji wan tûşbûyên koronayê berpirsê birêvebiriya tawanên wê girtîgehê ye û hepsiyan ji rêya wî kesî ve tûşê vîrûsa koronayê bûne.

Berê jî, di meha Xakelêwe ya îsal de, zêdetir ji 70 kes ji hepsiyan girtîgeha bajarê Urmiyê bona ceribandina vîrûsa Koronayê bo derveyî girtîgehê hatibûne veguhestin, herwisa hejmarek ji wan hepsiyan wê girtîgehê tûşê vîrûsa Koronayê bibûn.



Bi sedema agirberbûnê di bajarê Serpil û Zehawê de zêdetir ji yek hiktarek ceh û genim şewitîn

Roja Înê, 22`ê Gulanê, bi hegera agirberbûn bi bilindahiyên gundê “Zerîn Çûb” a bajarê “Serpil û Zehaw”ê, zêdetir ji 1 hiktarek ceh û genimê xelkê gundê “Elyas Mehmûd”, şewitîn.

Femandariya bajarê “Serpil û Zehaw”ê di hevpeyvîneke xwe de digel Nûçegihaniya “ILNA”ê ragihand: “Bi hegera agirberbûnê zêdetir ji 1 hiktarek ceh û genimên xelkê gundê “Elyas Mehmûd”ê şewitîn.

“Muhebbet Cemalîniya” herwisa ragihand: “Welatîyên wan gundan, bixwe hewla temirandina wî agirî dabûn ku bi wan îmkanatên kêr ew kar kiribûn, lê di dawiyê de 1 hiktarek ceh û genim di wî agirî de şewitîn”.

Bajarê “Serpil û Zehaw” di rojavayê parêzgeha “Kirmaşan”ê de ye û zêdetir ji 90 hezar kes di wir de dijîn û bi qasî 44 kîlometran sînorê hevpar digel “Herêma Kurdistan”ê heye û zêdetir ji 88 hezar hiktarek çavkaniyên sirûştî û daristan û çêrîngeh hene.



Du kes ji çalakvanên tora civakî ya “Instagram”ê hatine binçavkirin

Berpirsê Polîsê Agehî yê hêzên Întizamî ya parêzgeha Îlamê bas dike ku 2 kes ji birêveberên “peyçe”ên “Instagram”ê, di bajarê Îlamê de hatine binçavkirin.

Elî Mêhrî got: “Ew du kesane bi hegera balavkirina nûçeyên nerast li derheq dizîna dirav û zêr li ser tora civakî ya “Instagram”ê, hatine binçavkirin.

Pêka wî berpirsê leşkerî, ew du “peyçe”ên “Instagram”ê, nêzî 90 hezar kes “follower” hene û li ser nirxa zêr, sîke û dirav, nûçeyên nerast belav kirine û bi awayeke neyasayî çalakî kirine.

Berpirsê Polîsê Agahiya hêzên Întizamî ya Îlamê, her çiqas ku ti basek ji navên wan kesan nekiriye, lê ragihandiye ku ew 2 kesane bona lêpîrsînê radeştî navendên dadweriyê kirine.



Pirtûka “Dîrokeke Veşartî” hate weşandin

Pirtûka «Dîrokeke Veşartî» ku basê pişkek ji dîroka “Bakurê Rojhelatê Kurdistan”ê dike hate weşandin.

Ew pirtûk ji aliyê “Elî Munezemî”, endamê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ve hatiye nivîsandin.

Elî Munezemî, ew pirtûke pêşkêşî “hemû têkoşer û welatparêzên têniyê azadî û serbestiya Kurdistanê bi giştî, û bi xasmanî xelkê xebatkar ê bakurê Rojhelatê Kurdistan”ê kiriye.

Ew pirtûk ku li bajarê Hewlêrê hatiye weşandin, ji aliyê nivîskar ve wek xelat pêşkêşî “Rasana Rojhelat”ê hatiye kirin, bona ku dahata firotina wê, bo xizmet bi şoreşê were bikaranîn.




Mezopotamya pirtûkek ser rêzimana Kurdî çap kir

Ji aliyê Weqfa Mezopotamya ve, pirtûkek derbarê rêzimana Kurdî de hat çapkirin, ku xebatên Mela Mehmûdê Bazidîyî yên 160 sal berê hatî kirin tê de cih digirin. Balkêş e, ku Mela Mehmûdê Bazidîyî jî, ji bo ku Kurdî hînî Konsolosê Rûsî yê Erziromê bike, ew xebat kirin.

Di sala 1860î de li bajarê Erzirom a Bakurê Kurdistanê Konsolosê Rûsî yê bi navê Alexandir Jaba dixwaze hînî Kurdî bibe. Ji bo vê yeke jî Aleksandir Jaba Mela Mehmûdê Bazidîyî Bazidîyî peyda dike û ji wî waneyên Kurdî distîne. Ev daxwaza Jabayî dibe wesîle ku yekem xebata rêzimana xwerû Kurdî derkeve holê. Xebatên Mela Mehmûdê Bazidîyî jî piştî 160 salan ji aliyê Weqfa Mezopotamya ve wek pirtuk hat çapkirin. Pirtûka bi navê “Tûhfetûl XîlanFî Zimanê Kurdan” ji aliyê nivîskar Mîkaîl Bilbil û Mîstefa Oztirk ve hatiye amadekirin. Nivîskar Mîkaîl Bilbil amaje dike girîng e ku 160 sal berê Kurdan derbarê rêziman de bi zimanê xwe berhem dane.

Mîkaîl Bilbil-Nivîskar-dibêje”Ev pirtuk ne tenê rêziman e, beşa yekem rêziman e û 77 rupelê wê rêziman e. Beşa duyem ferheng e. Ferhengek gelek berfireh e qasî 50 rupelî ye, têra xwe jî balkêş e. Beşa din jî diyalog e.”

Yek ji girîngiya Rêzimana Mela Mehmûdê Bazidîyî jî ew e ku di demê hatî nivîsîn de li Erziromê û pîrraniya



Serhedê bikaranîna zimanê Kurdî di asteke gelek bilind de bû û berovajiya rewşa niha bû. Nivîskar Mîkaîl Bilbil dibêje xebata Mela Mehmûdê Bazidîyî di heman demê de bo Kurdan mîrateke hêja û çavkaniyek girîng e.

Mîkaîl Bilbil-Nivîskar- got:”Xebatên bi vî rengî sermiyanên me Kurdan in. Li bîblîyografiya Kurdî zêde dibe. Dema ku yek bixwaze xebatêkê bike pîrr girîng e ku zanibe beriya wî çi hatiye kirin. Wexta meriv çap neke û tişt belav nebe, mirov jê sudê wernegirin, wek referans neye dîtin xebat kêr dimînin.”

Di xebatên Mela Mehmûdê Bazidîyî de li gel agahiyên rêzimanê di heman demê de ferhengek jî heye ku ferhenga Kurdî-Tirkî ye. Di vê ferhengê de gelek peyvên ku di ferhengên roja me de cih nagirin jî hene ku yek ji van peyvên jî “Konelk” e ku ji sêhwanê re tê gotin. Amadekarên pirtûkê bang dikin ku lêkolînên dîrokî yên derbarê zimanê Kurdî de gelek pêwîst û girîng in.

Kurdistan 24

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Osman Mişefapûr warê xwe bi cih hêla

Di heyama rojên derbasbûyî de, “Osman Mişefapûr” girtiyê siyasî ê Kurd, bi sedema givaşa îdareya îtla`ata Pîranşarê, warê xwe bi cih hêla.

Ew girtiyê siyasî, piştî azad bûn ji girtîgehê bi awayê berdewam bo navendên ewlehî dihate veguhaştin û lêpîrsîn lê dihate kirin. Roja Pêncşemî 30`ê Xezelwer a 1398`an, “Osman Mişefapûr” û “Mihemed Nezerî” piştî 53 sal hepas, ji girtîgeha navendî a bajarê Urmiyê hatine azadkirin.

Osman Mişefapûr 28 sal û “Mihemed Nezerî” 25 salan di girtîgehê de bûn, ew du girtiyane heyama cezayên xwe di girtîgeha bajarê Urmiyê, Tewrêz û Recayî Şarê de derbas kirin.

Osman Mişefapûr di Pûşpera sala 1370`an di devera “Tirgower” a ser bi bajarê Urmiyê hatibû biçavkirin û piştî bi tohmata “endamê yek ji Partiyên Kurd ên Opozisyon yê rejîma Îranê” bi 25 sal hepsa te`izîrî hatibû cezadan.

Dawiya sala 92`an piştî 23 sal girtî, taya yek a dadgeha Înqilab a bajarê Urmiyê, bi serokatiya dadwer “Çabok” cezayê hepsa “Osman Mişefapûr” bo 35 sal hepsa te`izîrî guherî û dezgeha dadwerî ya rejîma Îranê, bi sedema şer kirin digel Spaha Pasdaran a terorîst cezayê 10 sal hepsê bi ser wî welatîyê Kurd de sepand.

Mihemed nezerî, girtiyê siyasî xelkê bajarê “Sayîn Qela” roja 9`ê Cozerdan a sala 1373`an, bi tohmata endamê yek ji Partiyên Kurd ên dijberê rejîma Îranê, ji aliyê me`imûrên eminiyetî yê Spaha Ebuzerî ya bajarê Bokanê ve hate binçavkirin û di dadgeha despêkî de bi serokatiya dadwer “Celîlzade” serokê dadgeha Înqilaba Urmiyê bi Îdamê hatibû cezadan.

Di encamê de cezaya bidarvekirina wan du welatîyên Kurd di sala 1378`an de, bo hepsa hata hetayî hate guherîn.

Ciwanekî ji aliyê Îtla`ata Urmiyê ve hate binçavkirin

Roja Çarşemî, 20`ê Gulanê, ciwanekî Kurd ê bi navê “Şehab Acî” kurê “Husên” û 23 salî û xelkê gundê “Gergul” û rûniştîyê bajarê “Neqede”yê, piştî banghêjkirina wî ji aliyê îdreya Îtla`ata bajarê Urmiyê ve hate binçavkirin.

Ew ciwanê Kurd bona lêpîrsînê veguhaştine bo girtîgehê û ti zaniyariyek di derheq qedera wî de ji ber deşt nîne.

Di heyamên derbasbûyî de, navendên ewlehiyê çendîn caran ew ciwanê Kurd banghêj kirine û lêpîrsîn digel kirine.

Heya niha, ti zaniyariyek li derheq hegera binçavkirina wî welatîyê Kurd de ji ber deşt nîne.

Du kolber li ser sînorê Serdeştê birîndar bûn

Roja Pêncşemî, 21`ê Gulanê, hejmarek ji kolberên Kurd, li ser sînorê wî bajarî raştî qullereşandina hêzên leşerî yê binkeya “Bêtoş”ê hatin.

Di encama wê teqeya hêzên leşkerî yê hikûmetê de 2 kolber bi navên “Mensûr Îsma`îlî” 30 salî û xelkê gundê “Baxî” û “Bextiyar Qadiriyan” 32 salî û xelkê gundê “Şelmaş” a girêdayê bajarê Serdeştê birîndar bûn.

Ew 2 Kolberê Kurd bi hegera gullereşandina hêzên leşkerî yê rejîmê bi tundî birîndar bûne.

Ew 2 Kolberên Kurd bona çareserkirina pizîşkiyê bo navenda dermanî ya bajarê Serdeştê hatine veguhanştin.

Welatîyekî Kurd li devera Tirgower a bajarê Urmiyê hate binçavkirin

Roja Pêncşemî, 21`ê Gulanê, welatîyekî Kurd ê bi navê “Îslam Enbaxûn”, xelkê gundê “Kurane” ya girêdayê devera “Tirgower” a bajarê Urmiyê ji aliyê hêzên kinc şexsî ve hate binçavkirin.

Hêzên kinc şexsî di gundê “Mawane” ya navenda devera “Tirgower” de bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî êrîşî ser maşîna wî welatîyê Kurd kirin û piştî çend teqeyên rû be esman, navbirî binçavkirin û bo ciheke nexuya veguhaştin.

Heya niha ti zaniyariyek ji derheq binçavkirina wî welatîyê Kurd û cihê ragirtina wî de berdeşt nîne û li peyketina malata wî jî bê encam maye.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (374)

Wêneyên bidawîhatina dewreya destpêkî ya 242 a pêşmerge

